Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 128
4'ê Şibata 2010
Buha: 150 Tûmen

agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Pêvajoya îdamê li Îranê de berdewam e

Heftiyek Piştî îdam kirina 2 kes ji xwenîşanderên roja Aşorayê, HucetulÎslam Îbrahîm Reîsî, Cihgirê Wezareta Dad a Komara Îslamî, ragihand ku 9 ji 11 girtiyên roja Aşûrayê dê li van zûyane de bihênê îdamkirin. Hêjayî gotinê ye ku her ji niha ve tirs û lerzê hemû wijûda rejîmê dagirtiye û bona pêşîgirtin ji bizavên nerazîbûnê û bi taybet li serûbendê 22' Rêbendanê de li her alavekê bo tepeserî û çavtirsandina xelkê mifahê distîne, ku îdam jî yek ji wan e.

**PDK Îranê Xwazyarê:**

# Helwestek Hevpar Dijî Pêvajoya Îdamê R: 3

## Komara Kurdistanê, Remza Xebat Û Berxwedanê



Bi boneya 2'ê Rêbendan;, 64'mîn salvegera avabûna Komara Kurdistanê, rêûresmek hêja û xweş li binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê de bi beşdariya endamên rêberî, hejmarekî berbiçav ji kadr û Pêşmerge, malbatên wan, hejmarek ji kesatî û nûnerên Part û aliyên siyasî yên Kurdistana Başûr birêve çû.

Rêûresm bi sirûda netewî ya ''Ey Reqîb'' û ragirtina deqîqeyek bêdengî bo rêzgirtin ji can; pak yê şehîden riya rizagariya Kurdistanê dest pêkir. Paşan birêz Têmûr Mistefayî, Endamê Deftera Siyasî a Partiyê, peyama Deftera Siyasî pêşkêş kir.

Deqa Peyamê di rûpel 1 û 2 ya Paşkoya taybet bi vê hejmarê de

## Baydin: Rêberên Îranê Bi Tepeseriyên Hovane Tovê Nemana Xwe Diçînin R: 2





## Qutbûna Înternêtê li Îranê, Siyasî yan Fenî R:3

Rûpela 2

Daxuyaniya Deftera Siyasî li ser birêve...

Rûpela 4

Efxanistan; Aştî An Hêviyên Stewir



Ebdulla Hicab

Rûpela 6

Siyaseta Çekdar Kirina xelkê Kurdistanê



Bêhzad Simko

Rûpela 7

Qazî Mihemed Bawerî Bi Demokrasî Û Cehd Ji...



Şikûfe Qubadî

Rûpela 8

Belaya Malwêranker Gihandin Xwendingehan Jî!



Azad Kurdî

# Daxuyaniya Deftera Siyasî li ser birêveçûna 8'mîn Pilînoma Komîteya Navendî

Em hemû aliyekê haydar dikin ku Komîteya Navendî ya PDK Îranê, hilbijratiya Kongireya Çardehem a Partiyê, demjimêr 9:30' ê roja Şemî, 30'ê Çileya Paşîn a 2010'ê Zayînî (10'ê Rêbendana 1388 a Rojî), Heştemîn Pilînoma xwe bi beşdariya Endamên eslî û Cihgirên Komîteya Navendî pêk anî.

Pilînom bi ragihandina deqîqeyek bêdengî bo rêzgirtin ji canê pak yê şehîdên vê dawiyê yên bizava nerazîbûnên Îran, Kurdistan û hemû şehîdên riya azadî û demokrasiyê dest bi karên xwe kir.

Piştî pesend kirina destûra rûniştinan, birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê ji aliyê Deftera Siyasî ve raporek siyasî li ser guhertinên cîhanî û deverî yên şûndaner li ser rewşa Îran, Kurdistan û herweha pêvajoya bizavên nerazîbûnên çend mehên derbasbûyî yên xelkê Îranê û erkê civatên xelkê Kurdistanê û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê pêşkêşî beşdarên Pilînomê kir.

Li vê rapora siyasî de nirxandinek hûr derheq her yek ji van meseleyên ku hatin ber bas, hatibû kirin û aliyên cur bi cur yên her yek ji wan meseleyan xistibû ber bas.

Li vê raporê de derheq bizavên nerazîbûnê yên xelkê Îranê, serbarê şanazîkirin bi biwêrî û berxwedana tex û qatên cur bi cur yên xelkê Îranê, serkut û tepeseriyên bêrehmane û hovane yên xelkê mafxwaz yên Îranê, destbiser kirin, Zîndanî kirin, îşkenceya nerazî û azadîxwazan ji aliyê Komara Îslamî ve hatibû mehkûm kirin û pêşniyaz hat kirin ku Komîteya Navendî daxuyaniyek taybet li pêwendî li gel girtiyan û birêveçûna hukmê îdamê li ser hejmarek ji girtiyan û sepandina hukmê îdamê bi ser hejmarek ji girtiyan û bi taybetî girtiyên siyasî yên kurd der bike û ji riya kom û komeleyên alîgirên mafê mirov ve van cinayetan zêdetir eşkere bikin.

Nirxandinê tekez li ser vê hindê kiribû ku radîkal bûna durûşmên xwenîşanderan ku rejîma Komara Îslamî bi tewahî nîşange girtibû, bi xwasta eslî ya xelkê Îranê û li heman demê de jî bi nîşaneya vê rastiyê zanî ku li çarçoveya Komara Îslamî de tu derfet û fersendek ji bo guhertina bi qazancê azadî û mafên xelkê ninin û herwekî pêvajoya bûyeran û ceribînên tevgera rizgarîxwazî nîşan daye, tevgerek dikare paşekişiyê bi dîktatoriyê bîne û armancên eslî û siyasiyên xelkê û netewên zulmlêkirî yên Îranê bi cî bîne ku bê dudilî û paşekişiyê li domandina xebatê berdewam be û maf û azadiyên xelkê Îranê li serweyî her berjewendiyek din danêt.

Nirxandinê tekez li ser vê hindê kiribû ku xelkê Îranê li her rewş û zirûfekê de, nemaze li egera paşdekişyana rêberên reformxwaz de dê li ser domandina vê Tevgera Kesk a gelî ku armanca vê misoger bûna demokrasî û mafên netewî yên gelên zulmlêkirî yên Îranê de sor û pêdagir bin. Li vê derheqê de jî erkê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê jî li egera rûdana her bûyerekê de diyarî kiribû. Li beşek din ji karê Pilînomê de nûnerê Komîteya Partiyê li Derweyî welat, dîtin û nêrîn endamên vê komîteyê derheq rewşa siyasî ya Îran û Kurdistanê bi agehdariya beşdarên Pilînomê gihand û pêşniyazên komîteyê li vê derheqê de pêşkêş kirin.

Beşdarên Pilînomê jî bi baldan bi naveroka rapora Sekreterê Giştî, bîr û boçûnên xwe anîn ziman û bi vî awayî jî rapor dewlemendtir kirin.

Li dawiyê de jî Pilînomê tevî pesend kirina raporê û destnîşan kirina erkên Partiyê li rewş û kawdanên cur bi cur de, Deftera Siyasî raspart ku bi liberçavgirtina raspardeyên Pilînomê, bernameya karê xwe li her rewşek pêşbînî kirî dabirêje û amadekariyên hewce jêre bike. Pilînomê li dawiya karê xwe de nirxandin li ser çend meselên têkildar bi kar û barên Partiyê encam da û biryarên hewce li ser de dan.

Pilînom piştî du roj karê berdewam, bas û nîqaş û destnîşan kirina erkan, êwariya roja Yekşemî, 11' Rêbendanê dawî bi karên xwe anî.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
12.11.1388
01.02.2010

Baydin:

## Rêberên Îranê Bi Tepeseriyên Hovane Tovê Nemana Xwe Diçînin



Cihgirê serokkomarê Amerîkayê Baydin, di hevpeyvînek Televîzyonî de ragihand ku: Amrîka hevdem li gel dirêjkirina destê xwe bo Tehranê, hevce ye ber bi hin dorpêçên nû li dijî Îranê gavan hilgire.

wî got rejîma Îranê baweriya xwe li nav xelkê xwe û derve jî li dest daye. Baydin tevî berevanîkirin ji siyaseta Obama derheq Îranê, lê ji aliyê din ve jî hin ji Komarîxwazên Amerîka xwazyarê vegerîna bo siyasetên Serokkomarê berê ê Amrîkayê derheq Îranê ne, anko guhertina rejîmê.

Herwiha Hîlarî Kilînton, Wezîra Karê Dereve a Amrîkayê roja Înê got: Hêzên mezin ên cîhanê ji ber vê ku li siyaseta lihevkirina bi Îranê re negihîştin çi encamekê, lewre li pey baykot û dorpêçan de ne.

www.arsivakurd.org

# Daxuyaniya Komîteya Navendî Derheq Zêdebûna Îdama Çalakên Siyasî

Hevnîştimanên birêz!
Xelkê azadîxwazê Kurdistanê!

Kor û Komeleyên alîgirên mafên mirov!

Rejîma Komara Îslamî ku li ser bingeha îdeolojiyek paremayî hatiye avakirin, midehê zêdetir ji 30 salan e ku desthilata tepeserkarane ya xwe bi ser xelkê azadîxwaz yên Îranê de sepandiye. Naveroka kewneperestane ya vê rejîmê bûye bi çavkaniya ferq û cudahîdanên li navbera xelkê Îranê û bêparhiştina wan ji maf û azadiyên wan.

Xwe bi heq û rewa û li serweyî îradeya xelkê dibîne û xelkê weke alavekê ji bo xurtkirina bîr û hizrên şaş yên xwe dibîne.

Ew rejîme her terze bîr û hizrek azadî û demokrasîxwazî, wekheviya jin û mêran, mafê mirov û daxwazên mafê netewî yên netewên zulmlêkirî yên Îranê dijî bawerên mesebî yên xwe dizane û bersiva her daxwazek bi vî awayî jî li dijberiya bi Xweda û bi diyardeyên Rojavayî nav dike û bi tundî serkut û tepeser dike. Her eva jî bûye sedem ku wek rejîmek dîktatorî, mana xwe li serkut, girtin û îdama xelkê azadîxwaz yên Îranê de bibîne. Eva jî liv û riftarek bûye ku li hemû jiyê vê rejîmê de derheq xelkê bêzarbûyî yên Îranê encam daye. Yasaya Bingehîn a îro ya Îranê, çavkaniyê ji bawerên mesebî yên Komara Îslamî digre û bi vî halî jî heta amade nine di çarçoveya vê yasayê de guh ji xwast û daxwazên xelkê bigre û xwe jî li hemberî wê yasayê de pabend nizane.

Hovêtî, dijî mirovî û dijî azadîbûna Komara Îslamî ger ji destpêkê ve heya niha bi nasînerê vê rejîmê bûne û li gor wê liv û lebat bi xelkê re kiriye, encamên wê kuştin, girtin û mişextî bûna bi milyon ji xelkê Îranê li pey re bûye. Niha jî piştî binav hilbijartinên gera Dehemîn a Serkomariyê û nerazîbûnên bi nisbet sextekariyên eşkere li binav hilbijartinê de ku pêla nerazîbûna xelkê bêzarbûyî û derbirîna kerb û kîna pengorî ya zêdetir ji sê dehsalên gelên Îranê û bizavên nerazîbûnê yên 7 mehên derbasbûyî bi dû xwere anî (ku bi navê Tevgera Kesk te naskirin), bêperde, eşkeretir û li ber çavê raya giştî ya cîhanê dest avête girtina berfireh a xelkê û îşkenceya girtiyan û derkirina hukmê îdamê li dijî neraziyan û azadîxwazan. Mixabin ew hukmên sepandî liser hejmarek ji girtiyên siyasî birêve çû û beşek din jî metirsiya birêveçûna hukmê îdamê li ser wan heye. Li vê derheqê de rewşa girtiyên siyasî yên kurd bi metirsiyê re berbirû ye. Serbarê wê ku bizavên nerazîbûnê li Kurdistanê de şibî Tehranê birêve neçû, lê heya amadekirina vê daxuyaniyê 21 kes ji têkoşerên kurd bi hincetên bê bingeh hukmên îdamê bi ser wan de hatiye sepandin û ew hukim jî li ser çend kesan de birêve çûye. Li gor ceribînên derbasbûyî, kerb û kîna rejîmê derheq bi gelê kurd, hemû ew xortên têkoşer ku ew hukmê nedadperwerane bi ser wan de hatiye sepandin, berbirûyê metirsiyên zêdetir in.

Li rewş û zirûfek wisa de ku azadîxwazên wî welatî bi taybetî azadîxwazên kurd pêre berbirû ne, bê helwestiya ji vê hindê zêdetir, riya cinayetên zêdetir ji bo rejîmê xweştir dike û can û çarenivîsa bi hezaran hevwelatiyên din bi kuştin, girtin û îşkenceyan berbirû dike. Lewre Komîteya Navendî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li 8’mîn Pilînoma xwe di rojên 30-31’ê Çileya Paşîn a 2010’ê Zayînî de, doma vê pêvajoyê ji serkut û îdamê, pir xeter û bi metirsî bo ser bizava azadîxwaziyê li Îranê û canê girtiyên siyasî zanî û hewildan ji bo pêşgirtina vê pêvajoyê bi erkek micid û bilez ya xelkê Îranê, Kom û Komeleyên alîgirê mafên mirov û navendên navnetewî zanî.

Her li vê derheqê de, PDK Îranê tevî wê ku hemû nûneratiyên xwe li welatên cur bi cur de erkdar dike ku li seredan ên bi wan Kom û komele û her aliyek têkildar de, metirsiyên domandina vê pêvajoyê eşkere bikin û li heman demê de jî bo her karek hevbeş û hevkariyek bi tesîr û karîger, amadegiya xwe nîşan dide û wê jî bi erkek girîng li hemberî çarenivîsa hemû girtiyan û bi taybet girtiyên siyasî yên kurd bo tev aliyekê dizane. Bi vê hêviyê ku dengê hemû aliyekê û hewl û xebatên Kom û Komeleyên mirovhez, bikare alîkariyê bi rizgariya girtiyan û dûrketina metirsiyê bo ser canê wan be ku hukmê nerewa yê îdamê li ser wan de hatiye sepandin.

Bi hêviya xebatên berdewam û berfireh yên tev aliyekê.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Komîteya Navendî**
**13.11.1388’ê Rojî**
**02.02.2010’ ê Zayînî**

# Qutbûna Înternêtê li Îranê, Siyasî yan Fenî R:3



li gor nûçegihaniya Îranê, egera pirsgirêk yan jî qut bûna bi tewahî a înternêtê di çend rojên pêş de heye.

Piştî maşkanêya bi nav hilbijartina Serkomariya Îranê rejîma Komara Îslamî ji bo pêşgîrî li pevajoya nerazîbûnê bi awayên cur bi cur dijberiya neraziyan dike û alavên pêwendî girtinê jî zêdetir tûşî pirsgirêk û astengan dike.

Di vê naberê de înternêt ji ber rola berbiçav a xwe di nûçegihanî, rengvedan û dengvedana bilez a bûyerên Îranê li doma pêvajoya bizavên nerazîbûnê de, pitir ketiye ber kuntirol û sansora rejîma Îranê. DI vê derheqê de her ji fîlterîng, Hek kirin, kêmkirina lezatiya înternetê û niha jî bi qutkirina wê dijberan kuntirol dike.

www.arsivakurd.org

**RONÎ**

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re



**Ebdulla Hicab**

# EFXANISTAN; Aştî An Hêviyên Stewir

Piştgirên dewleta nû ya Efxanistanê, di civîna xwe ya dawî de li Londonê, biryar dan ku destê aştiyê dirêjî hin beşên tevgera Taliban bikin. Eger ne bi dil be jî, lê Neteweyên Yekgirtî (NY), Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYA) û Brîtaniya jî piştgirî dan wê pêşniyarê ku ji aliyê Serokkomar Hamid Karzay ve hatibû kirin. Hevdem NY, navê 5 kes ji birêveberên pêşîne Taliban ji lîsteya terorîstan derxist. Ev biryar bersiva yek ji mercên Taliban bû ku ji bo rawestandina şer anîbû rojevê.

Pêşketinên dawîn yên Efxanistanê, dubare rewşa siyasiye welat, şerê li dijî terorê û tevgera tundajoye Taliban xiste rojeva cîhanê. Xuya ye ku piştî 8 salan şerê tund li hember Taliban bûn encamên ku hêzên hevpeyman li bendê bi dest neketin û niha bi pêwîst tê dîtin ku stratêjiyek nû ji bo çareser kirina pirsa Efxanistanê bê guftugo kirin. Lewma encamên Konferansa London li pir aliyan ve balkêş bûn.

Girêdayî bi wê çendê ve ku meriv bi çi çavî temaşey bûyerên Efxanistanê bike, niqaşên li ser stratêjiya nû ye hêzên hevpeyman û hevalbendên wan yên Efxanî ku îro di deselatê de ne, ji dîtinên cuda ve xwedî giringî ye. Her nebe 3ê dîtin dikarin weke hegerên derketina îhtimala guherîna stratêjiya hevpeymanan li Efxanistanê bêne bas kirin;

1) Aliyên pêwendîdar bawerî peyda kirine ku dem ji bo çareserkirina pirsgirêka Efxanistanê bi riya aştiyane ve hatiye û di wê pêvajoyê de bi pêwîst dizanin ku hemû alî beşdar bin.

2) Têkoşîna li hember terorê, ku bi şerê li dijî Taliban dest pê kir, bi ser neket û hêzên beşdar di şer de niha ji riyên derbas kirina xwe ji aloziyê digerin.

3) Taliban weke hêzek xwedî bandor li civaka Efxanistanê serketina xwe bi ser dijberên xwe de selimandiye û niha jî pêngav bi pêngav mercên xwe bi ser dewleta nû ya Efxanisatnê de ferz dike.

Dîtina herî aqilane û ya ku dikare bi xwe re aştiyê bîne ev e ku hêzên beşdar di pêvajoya siyasiye Efxanistanê de hatibin ser wê baweriyê ku pêwîstiya civakê bi tewaw bûna şer û aloziyan heye. Ji bo ku aştiyek berdewam vegere Efxanistanê, pêwîst e rêçareyek navînî bê dîtin ku di wê de hemû alî xwe beşdar bibînin. Bi taybet biserneketina stratêjiya ku li ser bingeha tune kirina aliyek an tevgerekê dimeşiya û heya niha tu encamên erênî ji bo civaka Efxanistanê bi xwe re neanî, wê hêviyê xurt dike ku hêzên Efxanî li gor wê baweriyê niha destê aştiyê dirêjî hev bikin. Di dema destpêkirina êrîşa hevpeymanan bo ser rêjîma Taliban, dema pêşeroja nû ya Efxanistanê di rojeva wan hêzan de bû, beşek ji serok eşîr, rewşenbîr, siyasetvan û pêşengên Efxan sala 1991'ê li bajarê Bonn li Alman civiyan û çarçoveya sîstema nû ya siyasî a Efxanistanê diyar kirin. Di wê civînê û di çarçoveya bas kirî de, tu cî ji Taliban û hevalbendên wê re di siyaseta nûye Efxanistanê de nehate diyarî kirin. Ji ber ku hêviyek wisan hebû ku şikestina Taliban, wê bibe hegerê têkçûna hemîşeiye wê tevgerê û di pêşeroja Efxanistanê de wê Taliban tu gav nekare dubare bê meydanê.

Lê niha 8 sal piştî ku Taliban ji deselatê hate dûr xistin, civaka Efxanistanê tenê yek pêgavê jî ji aştî û ewlekariyê nêzîk nebûye. Her yek ji serkirde û pêşengên meydanên şer, li herêmkê ji xwe re bûye hakim. Netewe û komên qewmiye cuda xwe ji deselata siyasiye navendî bi dûr digrin u civaka Efxanistanê ji caran zêdetir ber bi paşve çû ye, bi awayekê ku nasnameyên eşîrî, herêmî û olî ji her demê xurttir bûne û li ser wê bingehê jî civak pitir ji hev veqediya ye.

Weke din, civaka Efxanistanê bi awayekê ji hev qedya ye ku dewleta Karzay û hevalbendên wê yên navneteweyî bi tenê 30% welat kontrol dikin. Di gel ku Taliban bi fermî bi tenê 10-15% ji axa Efxanistanê kontrol bike jî, lê ji ber ku grûp û fraksyonên siyasî û eşîrî, her yekê bi awayê xweser herêma xwe birêve dibin, di rastiyê de hêza herî xurta siyasî di qada siyaseta Efxanistanê de her Taliban e. Di wê rewşê de tenê çareya Karzay û hêviya wî ji bo parastina berjewendiyên Efxanistanê weke welatek serbixwe di wê yekê de ye ku bi qewmiyeta xwe ya Peştûn re ku piştgirê sereke yê tevgera Taliban e, li hev bike. Ev yek jî tenê bi riya diyaloga bi Taliban re dikare pêk were.

Lewma ev demek dirêje ku Hamid Karzai, (Serokkomarê ji esla xwe Peştûn yê Efxanistanê) hewl dide heta piştgirên xwe yên navneteweyî îqna bike ku pêwîstiya wî bi vekirina deriyên diyalogê bi Taliban re heye. Çunku Karzai bi çavên xwe dibîne ku piraniya hevwelatiyên wî yên Peştûn, ji hevkariya wî bi hêzên derewe re nerazî ne û di hember wî de bi her awayî piştevaniya tevgera Taliban dikin. Zêdebûna êrîşên Taliban li hemû Efxanistan û bi taybet di nava Kabul a paytext de, Karzay aniye ser wê baweriyê ku bi şer nikare tehlîkeya Taliban ji nav rake. Li aliyek din ve beşek ji hevalbend û hevkarên nêzîke wî, bi bê xwestek ya erê kirina Karzay û piştgirên wî yên navneteweyî, bi gelek riyan bi Taliban re di nava diyalog û hevkariyê de ne. Êdî di rewşek wisan de tu rê ji pêşniyara çareser kirina siyasî û dialoga bi hemû aliyên civakê re maqûltir nîne Ji bo hêzên hevpeyman û bi taybet Amerîka jî, di dema niha de dialoga bi Talibane re derfetek e. Dema hevbendiya bi serokatiya Amerîka sala 2001 tevgera Taliban li Efxanistan ji kar avêt, ji bo demek kin ev hêvî çê bûbû ku êdî xelkê Efxanistanê ji şer û aloziyan westiya ne û kî deselatê bigre dest, wê bi dijberiyek ciddî re rû bi rû nebe. Baweriya ku tundutîjî û zexta ku Taliban bi kar dianî, wisan xelkê Efxanistanê ji hizr û deselata Taliban aciz kiriye ku zehmet e rê bidin dubare tevgerek tundajo vegere ser deselatê, hê zêde alîkarî dida wê dîtinê. Bûyerên wan çend salên dawî berevajiyê wê nîşan dan. Piştî 8 salan niha êdî nayê înkar kirin ku têkoşîna li hember terorê weke dihat hêvî kirin, heya niha jî encamek wisan nedaye. Ne li Efxanistan û ne jî di asta cîhanî de tehlîkeya hêzên tundajo kêm nebûye. Êrîşên terorîstî bi dawî nebûne û ewlekariya cîhanî nehatiye parastin. Ji xwe tevgerên Taliban û Al Qaide jî bi yekcarî nehatine şikandin û hê li Efxanistan û Pakistanê bi xurtî kar dikin. Lewma tiştek asayê ye ku hêzên beşdar di şer de niha ji riyên derbas bûn ji aloziyê bigerin.

Niha tevgera Taliban, ku bi pêşketinên xwe şa bûye bi pêwîst dizane riyek nû ji bo xurt kirina bandore xwe di siyaseta Efxanistanê de bigere. Taliban bi êrîşên wê dawiyê û bi pêwendiyên xurte ku bi serok eşîr û kesayetiyên Peştûn re çê kiriye, roj bi roj pitir nîşan dide ku niha ji caran zêdetir bi pêş dikeve. Lewma ji xwe bawere ku wê bikare pêgav bi pêgav mercên xwe bi ser dewleta nû ya Efxanisatnê de ferz bike. Piştî ku ew tevger sala 1991'ê ji kar hate avêtin, niha bi awayek nû xwe bi rêkxistin kiriye û ji ber piştgiriya ku di civakê de heye û bi alîkariya eşîrên Pakistanî, dubare bi xurtî hatiye meydanê û gefan ji birêveberiya nû ya Efxan dike. Êdî pir eşkere ye ku niha Taliban dixwaze bide selimandin ku bê hebûna wê di deselat û pêvajoya biryardanê, tu alî nikarin li Efxanistana îro de rolê bilîzin.

Niha ger hewla destpêkirina stratêjiya dialog û dirêj kirina destê aştiyê tenê bi mebesta xurt kirina dijberiya di nava tevgera Taliban û perçe perçe kirina wê tevgerê be jî, dîsan jî nîşan dide ku hêzên hevpeyman û dewleta Efxanistanê xwe neçar dibînin hebûna Taliban bipejirînin. Taliban jî neçare bi awayekê ji tevgera Al Qaide cuda be û bi Efxaniyên din re bikeve dialogê. Ev nerm bûn dikare hem bi qazanca hemû aliyan be û hem jî destpêkek be ji bo paş an jî pêşve gav avêtinên zêdetir. piştî zêdetir ji 30 sal şer û aloziyan, civaka Efxanistanê bi awayekê ji hev belav bûye ku tu hêz, partî an rêkxistin bi tenê nikare welat birêve bibe. Pirojeyek siyasî ku alîkar be hemû aliyên cuda di bin sîwanek hebeş a siyasî de bihevre kar bikin, dikare êş u azarên civaka Efxanistanê kêm bike. Lê gelo ew stratêjî wê bê manaya paşve gav avêtin li hember tundajotiyê de û dubare rê ji fanatîzma siyasî û dînî re weke, pirsek herî giring e ku carê bê bersiv e. Di mercên weha de ev car wê kî/ê an çi bibe qurbanî, ew jî pirsek bingehîn e.

# Îran û aloziya rewşa siyasî



Cawîd Esxerî



Piştî hilbijartina gera 10’mîn a Serkomariyê di Îranê de, bizavên nerazîbûnê yên xelkê Îranê li hemberî sextekariyên li hilbijartinê, li dijî rejîma Îslamî a Îranê dest pê bûn. Rejîmê serbarê tepeseriyan heta niha ne tenê nekariye xelkê nerazî çavtirsiyayî bike, belkî berevaj, pêlên nerazîbûnê roj bo rojê berfirehtir dibin. Bi taybetî piştî cinayet, kuştin û tepeseriyên di roja Aşûra de ku rojek pir pîroz ji bo musulmanên şîe meseb e, êdî nerazîbûn gelek xurttir û berfirehtir bûne.

Tiştek eyan û eşkere ye ku di Sîstemên wek Komara Îslamî de ku meşên nerazîbûnê, nemirovane û hovane tên tepeserkirin, kerb û kîn û bêzariya xelkê bi nisbet sîstemê dipengore û gava ku êdî sebra wan lêwrêj bû û avê bi ser serê wan de baz da, êdî ji her terze xebatekê bo hiloşandina desthilata dîktator û serberdayî mifahê distînin û li encam de ber bi goristana dîrokê ve dişînin.

Serhildanên vê carê yên xelkê Îranê li hember rejîmê, rojên destpêka salên 1978-1979’an tînin bîra mirov. Raste ku her du rejîm( ya Şa û Komara Îslamî) jî dîkatorî ne, lê dîsan jî çend cudahî di navbera wan de hene. Rejîma Îslamî a Îranê gelek pirsgirêk û arîşe hene ku rejîma Seltenetiya Mihemed Reza Şa ew arîşe nebûn. Bo mînak: Kirîza Navikî a rejîmê tevî welatên Rojava, desttêwerdanên zêde di kar û barên welatan, bi xeterxistina berjewendiyên Superhêzên Îro yên cîhanê û herwiha piştgirîya malî û menewî ji bizavên tundajo ên Îslamî di hemû welatên cîhanê de, bi taybetî di Felestîn û Lubnanê de. Lê bi vî halî jî me dît ku ji ber zulm û zor û cinayetên derheq gelên Îranê û siyasetên hovane yên rejîma Şa, di encam de ji aliyê xelkê nerazî ve hat hiloşandin.

Komara Îslamî ya Îranê jî niha rastî vê çarenivîsê hatiye, her çend ku hetanî niha ew tevgera nû xwedî rêberî nine, lê derbasî qonaxekî nû bûye ku carê xincî hiloşandina rejîmê, çarçoveyek diyar û rohn pêre xuya nake. Vê Tevgerê bi tewahî bingeh û stûnên rejîmê lerizandine, lewma rejîma Komara Îslamî a Îranê bona kontrola rewşê, dest avêtiye her alavek tepeserî û bêdengkirinê û li vê derheqê de tu yasa û rîsayekê, ne diparêze û ne jî berçav digre. Lê divêt bizanibe ku heya kengê dê bikaribe vê rewşê bidomîne!! Bê şik ew rewşe dê bi zûyî yekalî bibe û nîşanên neman û herifîna vê desthelatê her ji niha ve xuya û diyar in. Lewma serbarê tengasiyên ku rejîm têçeqiye, çend egerên din jî derdikevin holê.

- Li gel hemû tepeserkarî, cinayet û şidetên rejîma Komara Îslamî derheq xelkê Îranê, lê rejîm di bin zêrevaniya cîhanê de ye.
- Dûr nine gelek kes di nav erteş û Sipaha Pasdaran de ji ber mandîbûn û bêzarî ji zulm û tepeseriyên derheq xelkê Îranê, tevlî refên xelkê nerazî bibin ku bêşik ev yeka dikare prosesa hiloşîna rejîmê bihêztir û hêsantir bike.
- Ji bo pêşîgirtin ji her terze pevçûn, şer û kêşe li navbera Part û aliyên Opozisyonê de hewce ye her ji niha bername û pirograemek diyarîkirî ji bo kontirol û yekêtiya xaka Îranê bihê darêtin. Nexa berevajî wê, renge rejîmek şibhî Komara Îslamî ya Îranê deselatê bigre dest xwe yan jî bi dexaleta derekî, rejîmek sepandî û dilxwazê wan li ser Îranê de bihê hakim kirin.

Di vê navberê de, ya ku dikeve ser milê Part û aliyên siyasî yên kurd, ev e ku bikarin berî rûdana van egeran, pirsgirêk û dijberiyên navxweyî çareser bikin û bihevre serbarê xwe amade kirinê, weke enî û bereyek xurt, bihêz û bibandor ji bo berjewendiyên netewî yên kurd di vê rewşa aloz û awis ji guhertinên mezin û dilxweşker de ber bi pêşve gavan hilgirin û bi pirojeyek hevbeş hevpeymaniya kurdî derkewin qada siyasî ya Îranê.

Nexa berevaj, bi belavbûna part û aliyan û yeknebûna gotara siyasî a kurdî, dê xebata çendîn saliya kurdan avê de biçe û di lîstika siyasî de jî bi dorandî û dest betal carek din dê çiyayan hembêz bikin.

## Civata Îslamî Ya Zanîngeha Îlamê Hat Hilweşandin

êjneya Çavdêr bi ser rêxistinên xwendekarî yên Zanîngeha Îlamê di biryarekê de ragihand, ku civata Îslamî a xwendekarên Zanîngeha Îlamê hatiye hilweşandin.

Li gor rapora nûçegihaniya “Amir Kabir”, civata Îslamî ya Zanîngeha Îlamê, salek berî niha bi sedema endametî di “Deftera Tehkîmî Wehdet” ji aliyê zanîngehê ve ket bin zext û givaşan. Lêjneya Çavdêr doma çalakiyên wê civatê bi şertê derketin ji “Deftera Tehkîmî Wehdet” û herwiha ragihandina cuda bûn ji pêvajoya Elame ragihandibû.

Tê zanîn bi sedema pêdagiriya Civata Îslamî ya xwendekarên Zanîngeha Îlamê li ser helwêstên xwe û berxwedana yek sale, di heftiya borî de, lêjneya çavdêrî di biryarekê de îcazenameya Çalakiyên wê civatê hilweşand.

## Li Dijî Gefên Mûşekî Ên Îranê, Amrîka Xwe Amade Dike

Wezareta Berevanî ya Amrîkayê ragehand ku gefên Mûşekî ên Komara Îslamî a Îranê bo ser devera Rojhilata Navîn micid in û seba wê çendê Amerîka xwe amade dike. Rêxistina Berevanî Mûşekî a Amerîkayê “MDI” ser bi Wezareta Berevaniyê roja Yekşemî, 11ê Rêbendanê di nav avên Panaxa Aram de manovreke dijî mûşekî birêve bir û armanca wê jî jinavbirina Mûşekên Balistîk yên welatên weke Îran û Kureya Bakûr da zanîn.



Herwiha midehekê berî niha jî Amerîkayê du gemiyên teyar bi sîstema Dijî Mûşekî ên Balistîkî, bo Kendava Fars şandin û ragihand ku ew du gemî dê Şev û Roj di hat û çûnê de bin. Herwiha dewleta Obama dest bi damezirandina Sîstema Mûşekî a “Patiryot” li Emarata Erebî, Behrên, Kuwêt û Qeterê de kiriye.

www.arsivakurdi.org

# Siyaseta Çekdar Kirina xelkê Kurdistanê



Bêhzad Simko

Komara Îslamî ya Îranê bi meşandina siyasetek nigetîv û bi darêtina pîlanên cur bi cur û çekdakirina eşîretan bi merama parastina nîzama dijî mirovî a xwe, dixwaze carek din Kurdan bixapîne.

Mifahwergirtin ji serok eşîret û kesayetiyên bihêz û xwedî hititbar di nava civakê de, bona çekdarkirin û pêkanîna hêzên eşîretî yek ji pîlanên biyom û eşkere yên neyarên hakim biser Kurdistanê de ye.

Lêkolînkirin li ser civaka Kurdistana Îranê ji bo peyda kirina kesayetiyên nezan, berjewendîxwaz û egoîst ku di civaka îro de bêhêz û bê desthilat mane, yek ji giringtirîn şêwe xebat ên nepenî yên dezgehên sîxorî û serkutker yên rejîmê ye.

Bi vê hindê jî di her cî û mekanekê de xebat û tekoşînên bê rawestan û bê sinûr birê xistine .

Îro di Kurdistanê de jiyan gelek dijwar bûye û nebûna kar û xebatên aborî, jiyana civakî ya kurdan û bi taybetî jiyana nifşa ciwan xistiya nava kirîzek nediyar de, lewre dewlet vê hindê bikar tîne da ku pitir bikare jiyana civakî-kesîn (şexsî) a kurdan bidest bigre û kontirol bike.

Serok eşîretên ku îro kesên derdora xwe çekdar dikin, bo wê hindê ku her tim desthilatdar bin û hemberî Serok eşîrên din lawaz nebin, dikewin vê telika Komara Îslamî û bi nefamî û nezanî siyasetên dujminkarane yên rejîma Komara Îslamî dişopînin û dimeşînin.

Di nav eşîretên Kurdistana Îranê de yên gelek bihêz û welatparêz tên xuyakirin û bandorek enênî li ser jêhel birina seha netewî, şoreşvanî û haydarkirina xelkê Kurdistanê ji pîlanên dijî mirovî yên Komara Îslamî a Îranê hene û tu car nakevine nav dava van pîlanên biyom ên rejîmê û bihêsanî nahên xapandin. Ev yeke jî bûye sedema vê çendê ku rejîm herdem di hewla tepeserkirina wan kesan de be.

Lê hin kes jî hene ku niha jî bi nezanî û neagadarî ve xizmeta dewleta desthilatdar dikin û bi vî awayî jî Komara Îslamî ya Îranê bi fend û fêlên xwe û bi xapandina wan xelkên sade û sawîlke, her roj çengên xwe kûrtir li civaka Kurdistanê diweşîne û birînên wê kûrtir dike.

Guman têde nine ku her takek kurd, bîr û hestên nîştimanî û welatparêziyê li dil û derûna wan de xurt û bihêz e, lê renge bi hin qazancên demekî, temah û bi nezanî ketibne hêla siyaset û pîlanên dujminê gel (Komara Îslamî), lê divêt baş bizanin ku ew karê wan, pitir bo pêşvebirin û serxistina pîlanên qirêj yên dujmin e heta berjewndiya wan.

Ger nikarin hevkariya tevgerê bikin û li dijî pîlanên dujmin rawestin, bila aliyê kêm çekên dujmin danên û li refa dujmin de nemînin, çunku îro rojê Kurdistan di bin bandora dujminan de ye û gelê kurd heger bixwe bo welatê xwe di xebat û tekoşînan da nebe, dê roj li pey rojê zêdetir ji aliyê dujmin ve bihê asimîlekirin.

Rewşenbîrên kurd û bi taybet yên hundirê Kurdistanê, divêt bi xebatên zêdetir, bihêztir û berfirehtir bo civak, gel û welatê xwe gavan hilgirin û bi vê bawerê ku para herî zaf a barê serhildana gel, li ser milê wan e û alîkariya hêzên Kurdistanî bikin taku di pêşeroja xwe da, gelê Kurd jî wek gelek neteweyên din bibe xwediyê jiyanek azad û biromet.

Her kurdek Kurdistanî, pêwîst e hember polîtîka dujmin berxwedanê bike û serbarê pûçkirina pîlanên dujmîn, destê hevkarî, biratî û hevxebatiyê bo aliyê hev dirêj bikin, ji şaşî û kêmasiyên hev biborin û li dawîn rojên jiyana rejîma dîktatorî û paremayî de, bibin yek û xwe bo hiloşandina koşka zordariyê amade bikin.

## Mafê Mirovan



**Nivîsîn: Peter R. Baehr**
**Wergeran: Mecîd Heqî**

## Rola mafê mirov li siyaseta dereve de

Qutkirina pêwendiyên dîplomatîk, rêyek e ku dewletek nerazîbûna xwe li hember siyaseta dewletek din bo mînak pelixandina mafên mirovan nîşan dide. Lê ew rêye dikare mîna şûrê dû lêv kar bike. Luard aliyên negatîve qut kirina pêwendiyên dîplomatîk destnîşan kiriye. Ev mînaka Kambocê tîne ber ziman, ku li salên 1975 û 1978 an de qelaçoyên bêrehmane hatin encam dan. Di ber nebûna pêwendiyên dîplomatîke welatên Roj-ava digel wê welatê tu rêyek nebû ji bo kar kirin li sr siyaseta dewleta Kambociyayê. Ji bilî wê yekê li derewey Kambociyayê jî gelek kêm derbareyê bûyerên hundirîne wê welati dihat zanîn. Mînakek wilo derbareya welatê Guinea li Afrîqayê bi hegera rewşa wê welati rejîma Nguema bi hegera pelixanidina berfirehe mafên mirovan hat îsole kirin. Luard bi tundî dijberê birîna pêwendiyên dîplomatîk digel wan dewletane:

Zerer û ziyanên rewşek wilo dûqatin. Li aliyekê hêzên dereweyî nikaribin tu karekê ser kiryara dewletê hebin. Li aliyê dinwe xelkê bin dest wê hestê wê bikin ku hatine firêdan bêy ku kesek alîkariya wana biket. Nawendên potênsiyale serheldanê hêviya xwe ji dest tiden. Kilîse û desteyên dine olî bêy alîkariya dereweyî nikarin karekê bien. Sıyaseta îsole kirina welatekê di rewşek wilo da berewajiyê wê yekê ye ya ku tê daxwaz kirin.

Mirov dikare wê yekê ji berçav bigire ku li welatên Emrîkaya Latîn balyozxaneyên gelek welatan wek penagahek ji bo dijberên siyasiye dewletên herêmê hatin bi kar anîn. Li welatên komonîstî de balyozxaneyên dewletên Roj-ava alîkariya rohî û maddiye bizavên opozîsyon dikirin. Ewana hegerên dinin ji bo ragirtina pêwendiyên dîplomatîk gel wan dewletana. Ger kesek wan hegerane pesend bike, wê demê diviya sîgnalên qut kirina pêwendiyên dîplomatîk bê tewaw kirin. Ewa bi wê wateyê tê ku diviya nûnerayetiya dîplomatîka welatan bi awayek zelal bên rênwênî kirin ku di çi rewşekê de dihember dewleta serkut kar da kar bikin û di çi rewşekê de nekin.

www.arsivakurd.org

# Qazî Mihemed, Baweriya Bi Demokrasî Û xebat Ji bo Destveanîna Mafê Jinan



**Şikûfe Qubadî**

Komara Kurdistanê ji dîtingehên cur bi cur û ji aliyê kesên şareza û pispor ve hatiye şirov û lêkolîn kirin. Yek ji pirsên ku tim ji aliyê girûp û aliyên cur bi cur ve dikeve ber bas, eva ye ku erê gelo netewa Kurd dibe wekî Qewmê Kurd yan Miletê Kurd bihê binav kirin.

Di rastî de Qewm û Milet xwediyê zaf taybetmendiyên hevbeş in, nemaze: Zimanê hevbeş û çand û dîroka hevbeş. Lê ya ku taybetmendiya diyar a yek Milet e û Netewê ji Qewm cuda dike, eva ye ku netewe merama wan avakirina hikûmetekî neteweyî û beşdarî di desthilata siyasî de ye. Deskevta herî mezin a Komara Kurdistanê, selmandin û çespandina şunas û nasnameya neteweyî ji bo gelê Kurd bû.

Rêberî, mezintirîn û bibandortirîn sedem û faktera serkevtin an şikesta her tevgerekê ye. Rêberî bi wataya zanistiya xwe, piroseyek e ku têde kesek, girûpekê di pêxema gihîştin bi armancek hevpar de dixe bin bandora xwe. (Northousê, 1997). Qazî Mihemed wekî Serok Komarê Kurdistanê û rêberê PDK di wê demê de, mezintirîn amilê arastekirina vê tevgerê di riya dabînkirina demokrasî, mafên netewî û edaleta civakî bûye. Derbasbûn ji Komeleya Vejiyana Kurd ji bo Hizba Demokrat a Kurdistanê li ser bingeha felsefeyek kûr hatiye encamdayîn.

Berhevdan di navbera maramnameya Komeleya Vejiyana Kurd teví meramnameya PDK de derdikeve ku ev guhartine gavek bûye ji bo cihgîrkirina Sikolarîzim û dabînkirina demokrasiyê. Pirsa olî ku di mermname û pirograma Komeleya (JK) de wek yek ji xalên girîng yên wê tê hesibandin û bawerî bi olê Îslamî jî yek ji mercên endambûn di vê saziyê de bû, di bername û pirogramê Hizba Demokrata Kurdistanê de nehê xuyakirin.

Li cihê wê çendê, hin xalên weke berfirehkirina demokrasiyê, sîstema xwendina bizorî ji bo keç û kuran, avakirina saziyên çandî û pêkanîna derfeta mafê wekehev bo jinan tê xuya kirin. Bername û Esasnameya pesendkirî a Kongireya Yekem a Hizba Demokrat a Kurdistanê, hilgirê wateyên îroyîn yên demokrasiyê bû. Şûnwarên bicih mayî yên Komara Kurdistanê nîşan û eyankerê bawer û cihgîrbûna hikûmetekê ye bi pêkhateya modern îdarî ve.

Di rajnameya Kurdistanê çapa wê demê de, rêberiya PDK û li serweyî hemûyan jî Qazî Mihemed rapora civîn û rûniştinên xwe rasterast bi agahdariya xelkê radigehandin, nemaze raporta malî a Partiyê. Sefer û destkevtên Qazî Mihemed jî bi awayekî berçav di rojnama Kurdistanê de dihatin belavkirin. Ew yeka bi xwe nîşaneyek mezin e ji bawerî bi hewcehiya dana agehî û zanyariyan bi xelkê Kurdistanê û ji wê rêyê ve jî bi fermî nasîna mafê beşdarî kirina xelkê di biryardan û rêz û hurmet girtin ji hizra xelkê ye.

Pêşewa Qazî Mihemed weke Serok Komarê Kurdistanê û rêberê Hizba Demokrat a Kurdistanê hertim hewil dida ku ji aliyekî pirsa azadiya jinan, ku wê demê li Kurdistanê de kêm kes jê difikrîn, di nava endamên Komîteya Navendî yên Partiyê de bike bi bîr û bawerek kûr û ji aliyek din ve jî bi handana hevjîna xwe û herwisan dabînkirina pêwîstiyên malî, rêya xebat û pêgihandina jinan bi merema pişkdarîkirin di xebat û têkoşîna siyasî û civakî de xweş bike. Jinan li dirêjahiya temenê Komara Kurdistanê de karîn gelek serkevtinên hêja û berçav bidest bixin. Yek ji wan, avakirina Yekêtiya Jinên Demokrat a Kurdistanê bû. Vê Yekêtiyê karî di wê demê de bi lidarxistina Konferansên cur bi cur û dabînkirina Qotabxaneyan bo jinên bitemen, rêya beşdarî kirin di warên çandî û civakî xweş bike. Ewa jî bûye sedema bilind bûna asta hişyarî û zanyariya jina derheq mafên xwe û herweha şiyan û karînên wan. Ew piştgîriya hikûmeta Kurdistanê, bawerî bi xwe bûna jinan gihande astekê ku jinan karîn di civîn û kombûnên mezin de peyama xwe bigihînine guhê berpirsên hizbî û Hikûmî û mijarên civakî, siyasî û zanistî binvîsin.

Ji xebat û çalakiyên Yekêtiya Jinên Demokrat weke organên dinê ye hizbî, raportên taybetî û cur bi cur di rojname û belavokên wê demê de tên xuyakirin, û nemaze daxuyaniyên wan ji bo endamên wan di wan rojnameyan de dihatine belavkirin.

Di cejna serbixweyî û boneyên din



yên PDK de pişikdariya jinan û amadebûna wan girîngiyek taybetî hebûye û deqa axaftina jinan li Mehabadê û bajarên din yên Kurdistanê de li rojnameya "Kurdistan"ê de hatine weşandin. Pêşewa Qazî Mihemed li ser wê baweriyê bûye ku pişikdariya jinan di desthilata siyasî de, tiştek pêwîst e û li ser bingeha wê bawerê bû ku di meramnameya vê Partiyê de bi eşkere û ronî bas ji mafê wekhev û azadiya jinan hatiye kirin. Yek ji gavên din yên bibondor bo baştirkirina rewşa jiyanan jinan, bi pesend gihandina hin yasayan bûye bo piştgiriya jinan. Bo nimûne mirov dikare îşare bi pesend kirina yasaya cezadanê bo wan kesan bikin ku bi nisbet jinên xwe bi awayek tunûtûj liv û riftarê dikin. (Rojnama Kurdistan, hejmara 40).

Bi mifahwergirtin ji teoriyên lojîkî di civaknasiyê de (Dedukton), mirov digihîje vê encamê ku Qazî Mihemed bawerek kûr û bihêz bi demokrasiyê hebûye û xwe bi xizmetkarê xelkê zaniye û bi gorî kirina canê xwe ev bawere gihande kopikê.

Herwisan mirov dikare Komara Kurdistanê wek yek ji demokratîktirîn Hikûmet di Rojhilata Navîn de bi bîr bîne ku di temenek kurt yê desthilatdariya xwe de hemû xebat û tekoşînek wê di rêya misogerkirina azadî û dadperweriya civakî de bûye.

Jêder:
- Rojnameya Kurdistan, (Rojnameya Kurdistan, Mehabad 1324/1325'ê Rojî, berhevkirina Refîq Salih û Sidîq Salih)
- Hikûmeta Kurdistanê, Kurd di lîstika Siyasî ya Şorewî, Noşîrvan Mistefa Emîn, Wergeriya Samîl Bextiyarî
Vetenskapsteori, Torsten Thurên
En monoritets odyssê, Fuat Deniz

www.arsivakurd.org

# Belaya Malwêranker Gihandin Xwendingehan Jî!




**Azad Kurdî**

Bi rastî dewranek ecêb e û lîstika jiyanê ji wê ecêbtir bûye. Her çiqas tûşbûn bi madeyên bêhişker kirîz û pirsgirêkeke mezin a cîhanê bi giştî ye û hemû civaka mirovahiyê ji derdê wê û encamên nerênî ên wê belaya malwêranker dinale, lê tişta ecêb ew e ku xwendingehên welatekê bibin qada kirîn û firotina madeyên hişber û xwendekar tûşî wê nexweşiya bi xeter a mezin û dijminê jiyanê bibin.

Ew tişt di bin siya desthilatdariya Komara Îslamî de bicî hatiye û niha li Îranê xwendingeh û navendên xwendinê bi giştî bûne qada madeyên bêhişker. Çend sal bû ku ev pirs ketibû rojeva civakê, nigeranî hebûn. Hejmareke berçav xwendekar tûşî vê belaya malwêranker bûne yan beşek ji xwendekar bi bandora pirsgirêkên bengdariyê ve dinalin ku di hundirê malbata wan de kesên tûşbûyî hene û bengdariya wan pirr xurt e.

30 sal e ku desthilatdarên Komara Îslamî hemû serjimêriyeke durist derbarê pirgirêkên civakî bi giştî diveşêrin û tevlihev dikin. Di rastî de bidestxistina zanyarî û statîstîkên fermî û rast karek pirr dijwar e bo lêkolînvanên civakî û şarezayên vî warî. Siyaseta veşartina serjimêriyên durist ên pirsgirêkên civakî bo raya giştî, ne tenê tu xizmetek bi çareserkirina wan pirsan nekiriye, belkî roj li pey rojê kûrtir kirine. Ji ber van siyasetan niha civaka Îranê bi gellek diyardeyên bi xeter ên civakî rûbirû ye.

Di hefetya borî de li Tehranê konferanseke çapemeniyê bo Hemîdriza Babayî, Wezîrê Perwerde yê dewleta Ehmedînejad hat lidarxistin û mijara tûşbûna xwendekarên bi madeyên hişber





bû mijara wê' press konferansê'. Herçend Wezîrê Perwerdeyê bo yekemîn car red nekir ku di Îranê de xwendekarên bengdar û tûşbûyî bi madeyên bêhişker hene, lê tu serjimêriyek neda ku çiqas xwendekar rastî vê belayê hatine, tenê hebûna wê diyardeyê di nav xwendekaran de red nekir. Hemîdriza Babayî bo berevanîkirin ji Wezareta xwe û veşartina dubare ya wê diyardeyê wiha diyar kir: "Kes nikare înkar bike ku xwendekarên me yên tûşbûyî bi madeyên bêhişker tu ninin, me hene û emê bo dermankirin û çareserkirina nexweşiya wan jî hewlên xwe bidin." Navbirî bal kişand ser vê yekê ku di nav xwendekarên zanîngehê de jî gelek tûşbûyên bi madeyên hişber hene û di nav karmend, karker û piraniya tex û qatên din ên civaka Îranê de jî bengdarên madeyên hişber hene. Ev îtirafên wî zêde dişibin şanazîkirin bi destkevteke civakî û xizmetkirinê, ne bi diyarîanîna nexweşiyeke malwêranker a civakî!

Pirsa ku mirov pir diêşîne, ev e ku di bin siya desthilatdariya rejîma Komara Îslamî de niha xwendingeh, zanîngeh û navendên xwendinê bi giştî bûne qada kişandin, bikaranîn û kirîn û firotina madeyên bêhişker. Belayek malwêranker ku niha gefeke cidî ye bo ser civaka Îranê bi giştî.

Herçiqas serjimêriyên ne fermî behsa hejmareke zêdeyî 10 milyon kesên tûşbûyî bi madeyên bêhişker li Îranê dikin, lê li gor raporên saziyên dewletî, bi taybet "Navenda binav Xebat Li Dijî Madeyên Hişber", milyonek û 200 hezar kes li Îranê bi awayekî çalak û berdewam madeyên bêhişker bikar tînin û wek bengdar tên hesibandin. Herwiha bi rêya wan kesan ve 4 milyon û 800 hezar kes bendewarê wan madeyên malwêranker in û bi curekê di jiyana xwe ya rojane de ligel wan rûbirû ne. Ji her tiştî xirabtir jî ku mirov nigeran dike ew e ku navinca temenê bengdarên madeyên hişber roj bi roj tê xwarê û hêdî hêdî digîje nêzîk 13 saliyê. Tê gotin ku nêzîk 50 hezar xwendekarên keç û xort bendewarê kişandin û bikaranîna corên cuda ên madeyên hişber in. Heta Lijneya taybet ya Meclîsa Şêwra Îslamî a Îranê jî ku bi şopandina vê pirsgirêkê pêk hatibû, ev hejmara xwendekarên tûşbûyî bi madeyên hişber erê kiriye û di raporekê de weşand.

Kêfa Wezîr! gelek bi ketine rojeva vê pirsê û eşkerebûna van serjimêriyan nehat û got ew serhejmarî ne rast in! Di



halekê de ku ew tenê statîstîkên ne fermî ne, ne yên fermî, ger serjimêriyên fermî û durist bihatana eşkerekirin, Wezîr dê çi hest û helwestek hebûya! Lê bi tevahî jî înkar nekir ku xwendekarên bengdar jî hene ku madeyên hişber dikişînin.

Li gor raporekê ku ji aliyê Navenda Xebat Li Dijî Madeyên Bêhişker di malpera wê saziyê de hatiye belavkirin, di encama lêkolînekê de ku li ser 75 hezar xwendekarên zanîngehê wek nimûne hatiye kirin, ji sedî 20 ya xwendekarên Îranê ligel xetera bengdarbûn bi madeyên hişber rûbirû ne. Li gor wê raporê, tenê di sala borî de 116 hezar xwendekarên zanîngehê ketine bin bernameyên perwerde û pêşîgirtin ji bengdariya bi madeyên bêhişker. Rapora han destnîşan dike, ji sedî 13 ya xwendekarên dibistan û xwendingehên navendî û paş navendî jî ligel vê metirsiyê berbirû ne. Civaknas sedema zêdebûna diyardeya bengdariyê di nav xwendekarên Îranê de vedigerînin bo rewşa tevlihev û ne jêhatî ya malbatan, xwendingehan, civakê bi giştî û bi taybet pirsgirêkên abûrî, bêkarî, hejarî û nedariya berfireh ya beşeke berçav a xelkê.

Di hemû welatekê de navendên xwendinê bi giştî, cihê perwerdekirin û elimandina nifşa pêşeroja wê civakê ne û zarok û ciwan li dibistan, xwendingeh û zanîngehan tên amadekirin ji bo ku pêşeroja civakê ewle û dabîn bikin û civatê pêşde bibin, giringiyek taybet bi navendên xwendinê tê dan, lê di Îranê de navendên xwendinê jî belaya malwêranker a madeyên bêhişker gihandine xwendineghan jî!

# Qeyrekiçî Pirsek Din A Civaka Îranê



**Cefer Mubeşirniya**

Bi awayekî siruştî di hemû cîhanê de hin meselên civakî hene ku dibin sedema Qeyrekiçiyê, lêbelê di Îranê de seba siyaset û îdarekirina welat, pirsgirêka han çend qat zêdetir bûye.

Bo ronkirina vê meselê, hewce ye em hinek paşde vegerin. Her di despêka deselatdariya Komara Îslamî a Îranê de, vê rejîmê dest bi şereke nerewa û nehewce li gel Îraqê kir. Eger em cuda li her warekî din ên zirarmendiyê di wî Şerî de tenê behsa têkdana pêkhateya civakê bikin û di vî warî de jî basa mijara xwe anko Qeyrekiçiyê bikin, bi wî awayî destpê dikin ku di wî şerî de li gor serjhemariyên rejîmê 313 hezar ciwan hatine kuştin û 335 hezar kêmendam û 4 hezar êxsîr hatine ragehandin. Pêka sîstema serbaziya rejîmê ew qurbanî tenê Xort bûne. Tevî karîgeriya wî şerî li ser qeyrekiçiyê, rejîm wê bûyera nexweş bi 8 sal parêzeriya pîroz dizane û qurbaniyên wê, bi cangoriyê welat dizane, seba wê çendê qeyrekiçî mîna pisgirêkekê pejirandiye û sedema wê ji bo wî serdemî vedigerîne. wirde ger em zemanê destpêka şer hetanî dawiya şer hesab bikin, ji sala 1980 heta 1988'ê ger temenê keçekê 15 heta 25 sal be, bi awayekê "rêjeyaî" niha digîje 39 heta 49 saliyê, ku niha pirsgirêka qeyrekiçiyê di vî temenî de nine, belkî di 25 heta 35 saliyê de ye. Ku waye niha hin arîşên din di civakê de hene ku rejîmê tu hêcet jêre ninin, him di astek pir zêde û nerênîtir. him jî diyar û înkarnekirî tir.

Yek ji wan sedemên pêşhatina vê mijarê, givaşên siyasî û civakî ên rejîmê ne ku dibin sedema serhildan û şoreşên siyasî û çekdarî. Herwiha dibe sedema koçkirina ciwanan bo derveyî welat ku ew jî pêka çanda Îranî di herdu beşan de jî piraniya herî zaf a pêkhata wan xort in, ku ew jî li hejmara xortên welat kêm dike û derfeta zewicînê di temenê normal de pir zehmet dike û qurbanîdan di vê riyê de jî dom dike Lêbelê pisgirêka koçkirina ciwanan pir zêde ye û sedema wê çendê hin tişt in ku dibin sedema koça neçarî a ciwanan. Diyartirîn û eşkeretirîn sedem jî, nebûna derfetên kar, hejarî û nebûna azadiyên siyasî ye ku ji aliyê rejîmê ve hatine berteng kirin. Kuntirola ciwanan û ragirtina wan di destê xwe de, kêmkirina derfetên kar û pîşe bi armanca hewcehiya ciwanan bi xwastên rejîmê û herwiha başnebûna rewşa xwandinê dibe sedem ku li gor vekolîna Saziya Netewî a Ciwanan, 44 ji sedê a ciwanên Îranê xwazyarê koçkirina bo derveyî welat in. Nebûna îmkanên koçkirinê û pirsgirêkên ku li jor hatin baskirin, dibin sedema givaşan li ser ciwanan û herwiha gumana wê çendê ku nekarin jiyana xwe bimeşînin, û ji zewacê dilsar bibin.



Diyardeyeke din a malwêranker, pirsa madeyên hişber e. Lê ji bo ku em di çaçoveya basa xwe dernekevin, hewce ye ku tenê kartêkeriya wê diyardeya şom li ser qeyrekiçiyê bikin ku mijara behsa me ye. Eger çi mesela madên hişber û bengdariyê di welatê me de texa keç û jin jî pêve bûne, lê hejmara wan bi berhevdan li gel a mêran zaf kêmatir in û temenê bikar hînerên madeyên bêhişker niha gihîştiye 13 saliyê û li gor serhejmariyan niha zêdejî 10 Milyon moitad di îranê de hene ku eva jî faktereke bo xurt bûna qeyrekiçiyê.

Li rastî de ew hemû pirsgirêk, diyardeyên xirab, hejarî, nebûna azadiyê û Siyaseta xirab û hişk yên Komara Îslamî ku bi xwe sebebkarê pêkhatina wan pirsgirêkan in, bûne sebeb ku ciwanên welat bêtir li jiyanê dilsar bibin û radeya pire kiçan di Îranê de zêde û zêdetir bibeö çunku tu hêviyek ji bo çareseriya arîşe û pirsgirêkên civakê di bin siya Komara Îslamî a Îranê de nabînin. Eger hêviyek jî hebin, xwe di hin meselên siyasî weke pêlên nerazîbûnê di pêxema hiloşandina rejîmê de dedıxe.

Lewra gorî serhejmariya dezgehên civakî ên rejîmê ku cihê hitbarê jî ninin, hekî her keç û xortek li Îranê de jî bihevre bizewicin, dîsan milyonek û 700 hezar keç bê hevjîn dimînin. Herwiha gorî van serhejmariyan keçên ku temenê wan jorî 29 saliyê de ye, hejmara wan, xwe ji 7 milyon keçan dide ku hêj di benda jiyana hevbeş in. Ew pirs êdî nayê haşa kirin û rejîm nikare mîna meydana siyasetê, rolên xapandinê bilîze û di bin givaşên nawendên civakî de, vê yekê tîne ber bas, û herwekî dihat çavnihêrî kirin li Perlemantoyê de çend jinî yan pirr jinî!! wek çareser û rasparde bo kêmkirina vê diyardeyê pêşniyaz kir! Niha eger em lê hûr bibin ji bo çareseriya her pirsekê ku bikeve ber bas, rejîm netenê çaresernaka, belkî pirsgirêkek din pêve zêde dike. Li halekê de bi başî dizane ku çareseriya wan li kuderê avê ve dixwet û bi sîstema siyasî û îdarî ya welat re ku bi xwe deselatdariyê dike, neteba ye û heta ev rejîma dîktatorî û sedsala navîn li ser Îranê desthilatdariyê bike, pirisgirêkên han nek nahên çareserkirin, belkî dê hêj zêdetir û xurttir bibin.

www.arsivakurdi.org

# JIYAN Û MIRIN

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Jiyan, ji aliyê daringî ve pêvajoyeke sînordar û demdemî belê ji aliyê arişî ve bê sînor û bêdawî ye. Mirin jî, ji ber ku sînordariya jiyanê bi mirov dide fêmkirin û wateyeke giran li jiyanê bar dike, ew jî tiştekî gelekî girîng û manîdar e.

Her tişt bi dijberê xwe li wateyeke têgînî ya kûr û giring dadigere. Her têgîn bi dijwateya xwe manîdar dibe û tê fêmkirin. Jiyan û mirin jî du têgînên dijber û lêkneker ên ku bi hev û din ve girêdayî ne. Yanî jiyan, bi mirinê û mirin jî bi jiyanê watedar dibe. Ji aliyê fîzîkî ve, ev herdu tişt ji hev û din re dibin sînor; lê ji aliyê giyanî ve ev her du jî wekî du dijminên hêzdar li hemberî hev û din şerekî lêkneker dikudînin. Hemû tişt dijberê xwe di xwe de dihewîne. Yanî em dikarin bibêjin, hemû dijber, heta demekê bi hev re belê li hember hev dijîn. Belê şerê navbera wan û lêknekeriya wan bê westan û rawestan didome. Wekî hemû dijberanligel ku jiyan mirinê û mirin jî jiyanê di xwe de dihewîne jî dîsa yek dibe hûtê ya din û wê dadiqurtîne

Jiyan û mirin; wekî du dijmin û dijberên qedîm, tim li hemberî hev şer dikin. Şerê jiyan û mirinê şerê hebûn û nebûnê ye Di dawiya vî şerî de kîjan bi ser dikeve, ew serê ya din dixwe. Şerê navbera hemû dijberan bi vî awayî didome. Bo nimûne: Îro şerê navbera tevgerên aştîxwaz û hêzên şerûd û şerxwaz, şerê jiyan û mirinê ye. Têkoşîna tevegrên azadîxwaz û mafparêz, têkoşîna rizgarkirina mirovahiyê û têkoşîna bidestxistina jiyaneke nû û nûjen e. Bi kurtayî mirov dikare bibêje, berxwedan, serhildan, raperîn û têkoşîna wan ya li hember pest û kotek û çewsandinên tund û dijwar, nîşana jiyanê; belê bêdengî, xwesparî û radestbûna wan jî nîşana mirinê ye. Derheqa vê yekê de Bailey wisa dibêje: "Ne girîng e ku em çiqasî dijîn; a girîng ew e ku em bi çi awayî dijîn." Rast e. Ne ewqa muhîm e ku mirov çi qasî dijî. Ya muhîm ew e ku mirov ji bo çi an bi çi awayî dijî.

Jiyan, tenê ne hilmdayîn û hilmstandin e. Jiyaneke bênirx û bêrûmet, wekî barê mirinê ye. Yên ku xwe didin bin vî barî an jî naxwazin vî barî ji ser stûyê xwe bavêjin dê ew rojê sed carî bi mirinê re rû bi rû bimînin û bi mirin û miriyan re rabin û rûnên. Ango dê ew bi mirîtî bijîn. Divê gel û kesên bindest û bintûte, bi rêxistin û bi bibiryardarîyeke xurt dest bidin hev û jiyaneke nirxdar û rûmetdar. Îro, mirovahî, li navenda cîhanê, di Rojhilata Navîn de û li Mezrabotan, ji nû ve di dergûşa şaristaniyê de doş dibe. Divê gelên Rojhilata Navîn li hemberî mirina kerr û kor û lal tovê jiyanê bireşînin ser vê erdnîgariya qedîm; qey ku jiyan li ser vê xaka pîroz û adan ji nû ve zîl bide.

Tovê ku bi destê bav û bapîran hatibiye reşandin îro li ser koka xwe şîn dibe û li ser xaka bi hatinî û bê xêr û ber, şax vedide. Ev şaxan, şaxên jiyana bêsînor û bêmirin e. Li aliyê din jî dijminê jiyan û mirovahiyê bi hem û hêz û derfetên xwe, xwe li karê jiholêrakirina gelan girê dane. Ne xem e. Mirina ku ji bo jiyanê û di rêya jiyanê de be dê li hember jiyaneke mirî tim û tim bi ser bikeve.

Civat û civakên ku nizanibin bimirin, dê ewê nikaribin bijîn jî. Wekî ku li jorê jî hate diyarkirin; jiyan bi mirinê û mirin bi jiyanê watedar dibe. Belê jiyan û mirineke çawa? Ji bo wê divê mirov van herdu têgînan baş fêm bike û wan ji nû ve hilde dest û rave bike. Di mercên îroyîn de, wisa bûye ku her gav rêya hezkirina jiyanê, dimirinê re derbas dibe. Wekî ku şehîdên rojiya mirina mezin jî (li girrtîgeha Amedê) digotin "Em ji bo jiyaneke birûmet diçin mirinê..." Rast e. Jiyan di mirinê de veşartî ye. Lê herkes nikare bigihîje vê raz û sirê. Divê ku mirov bizanibe di wateya jiyanê de bigihîje; girîngiya jiyanê di dil û mêjiyê xwe de belê bi awayekî rastîn, bihishisîne; ango ji jiyanê hez bike. Herkes dibêje:" Ez ji jiyanê hez dikim." Gelo çend kes dizanin wateya jiyanê çi ye an çend mirov dikarin qîmetê bidin jiyanê? Qey herkes dikare mebesta girîngpêdana wê fêm bike? Bi rastî ew ne tiştekî asan û ketberê ye ku her mirov bikaribe wate û girîngiya jiyanê fêm bike û bibe layiqî wê.

Berî her tiştî, divê di riya jiyanê de ked û tab bête xerckirin û di oxira wê de berdêl bête dayîn. Divê mirov bi hest û bestên jiyanê bête dagirtin. Belê berî wê jî divê nirx û hêjahiyên jiyanê bi awayekî rastîn bête zanîn. Gelo çi ne ev nirx û hêjahî? : Hezkirin, rêzdayîn, yeksanî, biratî, aştî, pêwendiyên mirovî û girîngtirîn jî azadî û serxwebûn... Ango biderstxistina kesayetiya takekesî û civakî.

Heta ku ev nirx û hêjahî bidest nekevin, ne wateya jiyanê tê fêmkirin û ne jî mirov dikare li tu payedarî û rûmetdariyên mayînde bihesile. Heta ku di oxira van hêjahiyan de hezar jiyan neyên fedakirin, mirov ne dikare behsa hilm û çirkeya jiyanê bike û ne jî dikare bi aştî, azadî û serxwebûneke rûmetdar şa bibe.

Kaniya Helbestan

## Madre / Dayê



Isabel Martinez
werger: Zinar Ala

Dayê
Ax dayê
Digel ku sal li ser milên min cihê xwe girtin
[Weke kevirên giran]
Û hêdî hêdî zarokatiyê ji min jê dikin
Di kûrahiyê giyanê min de hîn ez zarokekî tirsonek im
Di vê derya xeydî de
Hembêza te take bendera selametiyê ye ji bo min
Bihêle vê şevê di nava xewnên min de
Ku rihê zaroketiya min di nava van de bijî
Bihêlê ku giyanê min di nav hemêza te de bigrî
Ji ber derd û dilşadiyan

Ax dayê!
Digel ku dûrbûn kêrek tûj e
Hundirên me hûr hûr dike
Van behr û çiyayên pir mezin
Nikarin rûyê te ji heşê min jê bikin
Deziya ronahiya veşartî ya ku evîna te ya herdemî dirût
Wê tim di nav sîngên me de bimîne


Ax dayê!
Vê şevê ezê ji ba bixwazim ku dengê te bîne
Bila peyvên te min dorpêç bikin û min di hemêza xwe de bihejînin
Wek çawa tenê evîna dayîkekê

[Evîna nermik û dilovan]
Dikare xwenên zarokekî bihejîne.
netewe.com

www.erebkurdi.org

# Şiroveya Gotinên Pêşiyan

**Beşa 10**



**Çiya Mazî**

Bi vana re veguheztina pêzanînê hatiye heta roja me ya îroyîn. Di roja me de, dîsa rêya ji tevliheviya pêzanînê xelasbûn, di sembolan de tê dîtin. Mînak: ji sembolên şîrketan û logoyên wan bigirin heta nîşanên partiyên siyasî û rengên qulûbên sporê , mirov dikare bijmêre.

Di dû vê diyarkirinê re mirov dikare bifikire ku gotinên pêşiyan remzên (sîmgeyên) bi wateya ziman î kûr, barkirî nin. "Di mirovê pêşî de pêşketina ziman, ji ber ku ji bizavkariyê derketiye, têginî ne. Di heman demê de wateya xwe ya kûr di hundurê xwe de dihewîne. Lê belê zimanê bi perwerdehiyê tê bidestxistin, têginên rûkalî û derewîn in. (Lev Semovîç Vygotskî- Raman û Ziman).

Zanistê ziman Naom Çhomskî di vê babetê de; bi watedarî ziman, wekî "çêkeriya rûkalî û kûr" bi nav dike. Di ziman de, çêkeriya têginî di rûkalî û kûrbûnê de; bi teknîkî, çêkeriya rûkalî î şîroveya dengî belî dike. Çêkeriya kûrbûniyê jî, hinek aliyên şîroveya wateyê bi temamî belî dike" (Ziman û Zîhn- N.Çhomskî, r- 186)

"Dîsa çêkeriyên rûkalî nabe tevkarên wateyê, çêkeriya kûr dibe tevkarên wateyê." (ziman û Zîhn- N.Çhomskî).

**Ji bo heman tiştî helbestvan Georges Jean, dibêje:"Hemû cûreyên lerziya hestan, bi rêya berhemên hunerî hatiye veguheztin. Lê belê wateya wan î kûr, amadekirî nehatine dayin" (C.J Nivîs Hişê Mirovahiyê).**

Bi du gotinên pêşiyan Mînak:

" Bê xwedê dibe bê xwedî nabe"

"Çêlikê maran bê jahr nabin".

Gotinên pêşiyan, bi derbirînek rûkalî xuya dike ku çiqas wateyek kûr hildigirin. Bi van diyardeyana; gotinên pêşiyan, bargirên wateya kûrî zimanan in. Antîkbûn û dewlemendiya zimanekî bi vê çêkeriya kûr diyar dibe.

"Di zimanekî de çêkeriyên kûr bi sînor in, kêm in" dibêje, Naom Çhomskî.

Di zimanê Kurdî de jî hebûna dewlemendiyek gewre, bi xebatên kûr î bi ked hatine amadekirin hatiye peyîtandin û hê jî dê bêne peyitandin.

Dîsa di zimanê Kurdî de sedem û jêderka sereke ya dewlemendiyê; ez bawer dikim divê, di mîrasa çandên Mezopotamya yên windayî de lê bê gerîn. Mînakek kifş jî ev e; di tabletên 5 hezar Salî yên Sumeriyan de, hinek peyv jê hê jî di Kurdiya îro de têne bikaranîn. Wekî "meclîsa şeşkala" , " erd û ab". (Dîrok Ji Sumerê Destpê Dike- Samûel Noah Kramer)

*(*) Nivîsara Hasan OZDEMİR e,( ji tirki werger Ç Mazî) di rojnameya internetî Rojev de hatiye weşandin. Ji bo, wateya kûrbûna ziman û gotinên pêşiyan derdixe holê û ji bo sûdeyê bide nîqaşan, ev jî li vir hatiye bicîhkirin*

**GOTÎNÊN PÊŞİYAN Û BİWÊJ – Qedrî DÊRSILAVÎ**

Pir caran em dibînin di civat û cimetên me de pir biwêj û gotinên pêşiyan têne bikaranîn û ev me bextiyar dike. Lewre pirbûn û bikaranîna biwêj û gotinên pêşiyan, nîşana dewlemendiya ziman û wêjeyê ye. Lê kêmanî an nezaniyeke me heye, em ji tevan re "Biwêj û Gotinên Pêşiyan" dibêjin;"Gotinên Pêşiyan". Ji van peyvan ên ku gotinên pêşiyan in. Ji xwe, tu rexne û gotina me jêre nîn e. Lê pirên van gotinên ku jê re dibêjin yên pêşiyan in, ku bi esl û feslên xwe, ne gotinên pêşiyan nin, "biwêj" in. Lê em dîsa, ji wan re jî dibêjin "gotinên pêşiyan" Yanî gotin bi xwe biwêj e lê hem ên ku bikar tîne û cimeta dorê jî ji van biwêjan re dibêjin gotinên pêşiyan. Ev jî dibe sedema gengeşî û tevlîheviyeke, ku dibe, di pêşerojê de jî serê me biêşîne. Digel vê rewşê tu gotin û rexneyên min ji gel re nîn e. Lewre li ser hûr nebûye, bi zor kare zimanê xwe biparêze, dê li ku lêkolînê bike, cudatiya nava "Gotinên pêşiyan" û Biwêjan" derxe holê û fêr bibe, kîjan biwêj e, kîjan jî gotina pêşiyan e? Lê em ji zana û xwendan re çi bêjin? Belê a herî xeter ew e ku zana, xwende û nivîskar û saziyên me jî pir caran dikevin vê xeterê. Ji biwêjan re jî dibêjim gotinên pêşiyan. Hele ên ku gotinên pêşiyan civandine, kiribin pirtuk û çap kirine!

Çend pirtukên Kurdî, ku bi navê "Gotinên Pêşiyên Kurdî" hatine çapkirin, ez lê rast hatime, min bi sedan biwêj ji wan hejmartin e. Bi a min sedemê vê yekê jî, lêhûrnebûn e, nekolîn e. Gel çi gotiye, me jî ew pejirandiye. Em lê hûr nebûne, me ne gotiye ka gelo, di lîtereturên zimanan de "Biwêj" çine, "Gotinên pêşiyan" çine? Bi çi awayî têne nasandin (tarîfkirin)? Tarîfa biwêjê çiye, tarîfa gotinên pêşiyan çiye? Di hinek weşanan de tarîf û nîşana wan hatibin zelalkirin jî, me dîsa ev tarîf nedane ber çav, ji me re hêsan hatiye û me ji tevan re gotiye "Gotinên Pêşiyan" Lê mixabin tev ne gotinên pêşiyan in. Dema mirov bi ser re lê dinihêre, mirov dibêje qey tev weke hev in, gotinên pêşiyan e. Lê ku mirov wate û bikaranîna wan bide ber çav û li ser van hûr bibe, dê mirov baş ji hev derxe ku biwêj û gotinên pêşiyan ji hev pir cihê ne. Minakek ji çewtî û kêmaniyên ku ez di nêz de lê rast hatime ev e:

Di Salnama NÇM 1999 de cudatiya nava biwêj û gotinên pêşiyan bi zelalî, bi çend xalan hatiye fesîhkirin.(Ew jî ji nivîsara *Çiya Mazî* ya kovara Zendê hatiye girtin).

Dîsa, di hinek rupelên salnameyê de, bi navê gotinên pêşiyan pir biwêj hatine weşandin. Hinek jî di van rupelan de hene, navê gotinên pêşiyan li wan hatiye kirin, lê ne biwêj in û ne gotinên pêşiyan in. Hinek jî gotinên pêşiyan in. Lakin forma wan hatiye guhêztin.

Dixwazim, hinekî li van herdû dewlemendiyên ziman hûr bibim û çend cudatiyên girîng î, di nava biwêj û gotinên pêşiyan de rêz û dubare bikim.

Gotinên pêşiyan bi taybetî, ji bo mirov ders û şîretekê jê derxe hatine gotin. Taybetiya gotinên pêşiyan ên herî girîng hukmê (darizandin) ilmî, an jî şîret (pend) tê heye. Yanî a ku em jê re bibêjin gotina pêşiyan, an ji sedî sed rast e, ilmî ye an jî divê mirov jê ders bigire, pendî be (şîret).

Weke biwêjan gotinên pêşiyan jî peyvên qalibî ne. Yanî çiqas heman wateyê bide jî bide, nabe ku mirov peyvekê ji hevokê bide guhêztin, derxistin an zêdekirin. Weke ku em bibêjin: (1)"roj bi bêjingê nayê veşartin (2) rastî tahl e. an (3) rev nîvê mêraniyê ye". Gotina yekem ji sedî, sed raste. Yanî tu kes nikare bibêje ku "Roj bi bêjingê tê vaşartin" Em ji kê bipirsin û bi çi tewrî bi ceribînin, dê ev peyva me rast derê. Peyva dûyem û sêyem jî, ji sedî sed rast in, lakin ne di her rewş û demê de. Yanî rastî, di her rewş û demê de ne tahle. Carina dibe ku rastî şêrîn be jî. Lê tiştek heye ku hatiye serê me teva, yanî me piran ceribandiye ji ber hinek mirov, gotina rast peyîvîne, derdorê an dost û hevalan, xwe jê xeyîdandin e. Ev ji ber ku hatiye ceribandin, bûye tiştekî ilmî. Ji xwe di her rewş û demê de jî nayê bikaranîn. Dema ku mirov tiştekî rast bibêje û derûdor xwe bi xeyîdînin ev gotin tê bikaranîn. Û gelek di cihê xwe de ye, rast e. A din, "rev" jî wisa, dema ku li mirov biqewime (mirov têkeve tengasiyekê) û mirov çongşikestî nebe, bireve, xwe xelas bike, ew jî dibe mêranî. Weke gotina dûyem ev jî ne li her der û demê tê bikaranîn. Lê dema ku mirov van herdû gotinan di cihê wan de bikar bîne, kes nikare, mirov li virê bi qelibîne û bibêje tû ne rastî. Kî dibe bila bibe, dê rastiya van gotinan bisediqîne û ev jî dibe ilmî. Gotina (4) "serê gurî di bin kum de baş e û (5) " an mêrekî baş be, an bivir û das be, an jî bimre ji xwe re xelasbe" jî dîrek ji bo mirovan şîret in. Yanî mirov jê ders digire. Gotinên (6) "şûr kalanê xwe nabire" û (7) xeta çot ji gayê pîr xware" hem ilmî ne, civakî ne, hem jî şîret in. Mirov kare bibê ku felsefî ne jî. Ji dervayî hinek îstisna herdû jî rast û bi serê xwe ne. ilmî ne, ji xwe îstisna jî qaideyan xera nakin. Gotina (8) "ziman quto serî rihato" jî hem ilmi ye, hem jî şîret e. Yanî ku "tu zimanê xwe kin bigrî, pir zêde ne peyîvî, dê serê te rihet be. Û me teva ev ceribandiye ku di civakan de, mirovê kêm xeberdan û ne fesad be, serê wan nakeve derd û belayê. Tebî ji dervî îstisnayan.

Dema mirov bala xwe didê, di van gotinan, tevan de şîret hene. An jî hukumê ilmî (ku ew jî şîretin) hene. Di hinekan de jî, hem hukum heye, hem şîret heye. Lê di biwêjan de ne şîret hene, ne jî hukumê ilmî hene.

Biwêj, rewşekê, ramanekê, dilîniyekê buyerekê an jî fêrekê di bîra mirov tîne. Ger em bibêjin "Roj bi bêjingê veşartin" û "Zimanê qut" Û "Serî gurî di bin kum de" hînga ev gotin dibin biwêj. Lewre rewşê dide îfade kirin û tê de tu hukum û şîret jî nîn in. Ku em car caran, di biwêjê de hukum jî bibînin weke "quna tazî, sîle dixazî" têde hukum hebe jî, tu wateyeke ilmî nîn e. Û tu şîret jî tê de nîn e. Ji bo zarokên, ku paqtazî li sikak û kolana digeriyane, hatiye lihevkirin û gotin. Dûre jî bûye biwêj. Biwêj jî weke gotinên pêşiyan xwedî qalibin. Ne dibe mirov gotinekê jê biguhêze, ne gotinekê jê derxe, ne jî gotinekê lê zêde bike.

www.arsivakurdi.org

**Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:**
AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail: agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com**



## Şêwra Evlekar Li Ser Hinartina Çek Û Teqemeniyan Ji Bo Îranê Lêkolînê Dike



Dewleta Taylendê raporek pêşkêşî Şêwra Ewlekar ya NY kir û têde hatiye ku dest bi ser barek çek û teqemeniyan de girtine ku ji Kureya Bakûr ve ji bo Îranê dihat şandin.

Li gorî rapora bbc, li rapora Taylendê de hatiye ku li nav wî barî de hejmarekî zaf ji alavên mûşekî têde bûne. Biryar e roja 11'ê Februarî, Komîteyek şêwra ewlekar ya NY ku li ser dorpêçên bi ser Kureya Bakûr de çavdêriyê dike, rapora xwe li vê derheqê de bide bi şêvra ewlekar. Sala borî jî Imaretên Yekgirtî yên Erebî jî dest bi ser Gemiyek barhilgir a çek û teqemeniyan de girt ku ji Kureya Bakûr ve ber bi Îranê ve dihat şandin.

## Dadgeha Ewropayê Jî Nexwest X, Q, W Hebin




Du rojan berî niha li Dadgaha mafê mirovan ya Ewropayê(DMME) li Strasbourgê de, du dozên girîng hebûn. Yek li ser mesebê Elewîtî û ya din jî di navên kurdî de bikaranîna tîpên **Q, W , X** bû. Aqibet wê Dadgehê biryara xwe li ser her du dozan jî da.

Dadgehê biryar da ku ji nasnameyan, xaneya olê rabe û di derheqê tîpên kurdî de jî biryar da ku tîpên ku di alfabeyê de tune ne, nabe bihên bikaranîn û ji bo tîpên kurdî Tirkiye mafdar dît.

DMME biryara xwe li ser daxwaznameya 8 kurdên ku dixwestin tîpên kurdî di navên zarokên xwe de bikar bînin, biryara xwe da. Her 8 kurd berê ji bajarên cuda serî li dadgehên Tirkiyeyê dabûn ku ew dixwazin di navên kurdî de tîpên kurdî yên wek Q, W, X-ê jî bikarbînin, lê daxwaza wan ji alî mehkemeyên Tirkiyeyê ve hatibûn red kirin.

Li ser vê, ew kes serî li DMME yê dixin û daxwaz kiribûn ku navên ku, ew rojane bikar tînin, di nasnameya wan de jî bêne nivîsîn û ragihandibûn ku ev biryara Tirkiyeyê li dijî diskrimineringê û rêzgirtina jiyana taybet ya mirovan e.

Xwediyên dozê bi xwe re hin belge wek nimûne jî biribûn dadeghê û ji van belgeyan nimûne dabûn ku hin kesên biyanî dema bi kesekî/a tirk re dizewicin û heke ev tîpên qedexe di nav navên wan de hebin jî dîsa di belgeyên wan ên fermî de têne nivîsîn. Her weha ev ji bo navên şîrketên biyanî jî derbas dibin.

DMME di vê dozê de biryar da ku ev doz ne li dijî madeya 8. û 14an e. **NETKURD**

## Selahattin Demirtaş û Gultan Kişanak bûn Hevserokên BDP'ê

### Erdoxan peyama pîrozbahiyê ji Demirtaş re şand



Serokwezîrê Komara Tirkiyeyê Recep Tayyip Erdoxan, ji ber ku Serokê Giştî yê BDPê hate hilbijartin, ji Selahattin Demirtaş re peyamek pîrozbahiyê şand. Li gor agahiyan, piştî ku Demirtaş di Kongireya Yekem ya Awarte ya BDP'ê de wek Serokê Giştî hate hilbijartin, peyama pîrozbahiyê a yekem ji Serokwezîr Erdoxan girtiye. Erdogan, di peyama xwe ya ku bi îmzeya Serokê Giştî yê AKP'ê ji Demirtaş re şandî de weha dibêje: "Ji ber ku di Kongreya Yekem ya Awarte a Partiya Aşitî û Demokrasiyê de hûn wek Serokê Giştî hatin hilbijartin, ez we pîroz dikim. Hêvî dikim Kongreya we ji bo demokrasiya Tirkiyeyê bibe wesîleyeke xêrê û silavên xwe pêşkêş dikim." Hêjayî gotinê ye ku çend roj berî niha BDP'ê yekem Kongierya awarte ya xwe li Enqereyê li darxist. Di kongreya BDP'ê de destûr hate guhertin û ji vir pêve dê Serokatiya Partiyê bi sîstema "hevserokatiya veguhertî be. Di hilbijartinan de Demirtaş û Kişanak ji 289 dengan, 288 deng girtin û bûn hevserokên nû yên BDP'ê. **Rizgarî Online**

## Ji Bîra Avê 150 Mar Derketin



Li gundê Aşagitaşmalî ya devera Çêrmûga Diyarbekirê, ji bîreke avê, nêzî 150 heb Mar derketin.

Xwediyê bîrê, Bekir Ozkahraman dibêje, piştî ku ava şebekeyê hatiye gund, salek dibe ku ava bîrê ji bo vexwarinê bikar neaniye. Tenê ji bo ku avê bide heywanên xwe, ava bîrê bikar tîne.

Bekir dibêje, heta midehek berî niha bîr heta nîvî bi avê tije bû. Dema vê carê ji bîrê avê derdixe, ew wan Maran dibîne. Piştre ew bang ji gundiyan dike da ku bihevre hemû Maran derbixin. Li encam de ew 15o Maran li bîrê de derdixin.

Dirêjbûna maran 30 cm heta 2 metreyan diguhere.
**NETKURD**